

herî berbiçav ên Ewropî wergerandin û veguheztin zimanên xwe û di vejandin û pêşvexistina wêjeya gelên Rojhilata Navîn de gavek bi bandor avêtin.

Hêjayî gotinê ye ku heger wergera ramanên zaniştî û çandî di warê pratîkî de ne xwedî bandor û geşedaneke erênî be, ew ê di pêşveçûna zaniştî û şarîstanî de bê encam be.

Di dema niha de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di milê wergera di navbera zimanên fermî (Kurdî, Erebi, Suryanî) de lawazî û qelsî heye, her wiha di navbera van zimanan û zimanên rojhilata navîn mîna Farisî, Tirkî, Ermenî... hwd û di navbera zimanên cîhanî yên xwedî bandor de jî lawazî hey. Wergerên nivîskar, ramanwer û zanyarên navdar ên cîhanê pir kêr peyda dibin, û sedema vê nebûna navendên werger û wergêrên jêhatî yên ji hêla wêjeyî û zaniştî ve ye, her wiha guhdana û teşwîqa ji bo wergerê jî kêr e. Lewma bandorê li pêşveçûna zaniştî û wêjeyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike.

Ji bo pêşketina tevgera wergera wêjeyî û zaniştî, pêwîst e aliyên têkildar ên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê gavne mezin di vî milî de bavêjin, ew jî bi rêya zêdekirina navendên wegerandinê û pêşxistina navendên heyî, di hêla aborî û manewî de, her wisa avakirina navendên pêşketî ji bo fêrkirina zimanan, şandina şandeyên zaniştî ji bo zanîngehên navneteweyî, da ku pisporî û zaniştî pêwîst ji bo wergerê bideştboxin û pêdiviyên wergerê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk bînin. Ji aliyekî din ve, divê dezgehên ragihandinê, zanîngeh û akademî, girîngiyê bidin vê zaniştê.

Ji ber girîngîya wergerê û rola wê ya mezin di pêşketina zaniştî û çandî û dewlemendiya miletan de, desteya sernivîskar a kovara “Şarmola” ev mijar ji bo hejmara heştêmin weke dosyaya hejmarê destnîşan kir. Her wiha Di vê hejmarê de gelek mijar, lêkolîn û nivîsên wêjeyî yên curbecur hene. Bi hêvîya ku xwîner sûdekê ji wan werbigrin.

wan ser çanda alîyê ku jê re tê wergerandin hebe.

Rêbazên wergerandinê li gor awayên wêjeyî û zaniştî yên cuda cuda ne. Berhemên zaniştî yên mîna bîrkarî, bijîşkî, fîzîk, kîmya û erdnîgariyê, di wergerandinê de pêdivî bi rastbûn û objektîfîbûnê heye, bêyî ku destwerdana heştan tê de hebe û naskirina wergêr bi têgeh û termên zaniştî hebe, ev ji bo hemû lêkolîn û gotarên zaniştî jî derbasdar e. Ji bo hin cureyên wêjeyî, mîna roman, çîrok û helbestê, hewcedariya wan bi naskirina teknîk, rewanbêjî û hunerên form û celebên wêjeyî heye, her wisa pêwîst e wergêr xwedan şiyaneke mezin be ji bo xweşîkbûn û estetîka nivîsê derxîne holê, ew jî bi rêya bikaranîna bêje û ristên guncan li gor ên ku di metna orjînal de hene, da ku bandor li asta nivîsa ku tê wergerand neb.

Bi rêya “wergerê” nixê zanişt û zanyaran di Serdema Navîn de li Rojhilata Navîn bilind bû, nemaze di serdema Ebbasîyan de, “Mensur, Harûn El-Raşîd, al-Mamûn...û hwd” ên ku ji bo wergerandina zanişt, zanîn û felsefeya Grîkan teşwîq dikirin û bi vî rengî, di hemû zaniştan de ronasek pêş xistin. Nivîskar û wergêrên Suryanî wê demê di tevgera wergerandinê de “ji Latîni û Grîkî bo Erebî” roleke berbiçav lîstin. Wergera ji wêjeya Farisî bo Erebî bandor li ser rastîya wêjeya wê demê jî kir.

Ewrupîyan jî di wergerandina zanyarî, felsefe û wêjeyê de ronaseke wêjeyî û zaniştî pêk anîn, ku heta niha bandora wê li tevahîya dunyayê heye.

Werger, di sed sala nozdehan de, piştî sed salên paşverûtiya serdema dagirkerîya Osmanî (Tirk) de, roleke mezin di vejandina gelên Rojhilata Navîn (Ereb, Kurd, Suryan, Ermenî û yên din) lîstîye. Faktora herî berbiçav a ku di vî milî de xwedî rol bû, danûstandin û têkilîyên hin ronakbîran bi çanda gelên Ewropayî re bû, ku bi rêya şandeyên Ewropî yên ku dihatin herêmê pêk dihat. Di encama van tekilîyên çandî de, ronakbîrên gelên deverê berhemên fikrî, wêjeyî û zaniştî yên

Pêşekî

Werger ... Parastin û pêşkeftina şaristanîya mirovahîyê ye



Desteya sernivîskariyê

Xweş tê zanîn ku “werger” di dewlemendkirina çandên neteweyan, nêzîkbûna gelan, pêşxistina zanîne û di ronesansa şaristanîya tevahîya mirovahîyê de, roleke mezin dilîze.

Werger zanişt û huner e, xwedan teknîk, rê û rêbaz e. lewma kesê Wergêr divê xwedan çandeke berfireh be, her wiha di herdu zimanên (jêder, armanc) de aştî ya fêmkirin û têgihîştinê xurt be, û di rastîya sîyasî, civakî û çandî ya serdema ku berhem tê de hatiye afrandin de, serwest be. Berhemên ku tene wergerandin çiqas bi nirx bin jî alîyê wêjeyî û saniştî de, wê ewqasî bandora